# Bi Thomas Ripper re li ser Merwaniyan

HEVPEYVÎN: **ABDULLAH İNCEKAN**
aincekan@gmail.com

Li cîhanê kêm netewe hene ku li hebûna xwe xwedî dernakevin. Li cem van qewman tu qedr û qîmeta çand, huner, ziman û sembolên neteweyî yên wan tuneye. Qewmên bi vî terhî xwe li sembol, ziman û çanda gelên serdest digrin; ji bo wan tarîx, folklor, muzîk û her tiştên ku qewmekî dike qewm bême'ne ne û loma jî ew bi gelemperî li van hebûnên xwe xwedî dernakevin.

Ku meriv li gelê Kurd mêze dike, meriv dibîne ku ev nexweşiya han di wîcûda wan de bûye kangren û em dikin-nakin xwe ji vê nexweşiyê xelas nakin û loma jî em yek ji belengaztirîn gel in li ser rûyê erdê. Herçiqas ku di salên dawîn de pêşveçûnên baş hebin jî, lê bixwehesandineke bi gişkî hê çênebûye û em -mîna zaroka teze hînê rêveçûnê dibe- bi gavên piçûk ji folklor, ziman, edebiyat, tarîx û coxrafyaya xwe haydar dibin.

**Rojhilatnas û zanayên biyanî**

Di vê karê xwenasînê de em dibînin ku rojhilatnas û zanayên biyanî xwedî xîreteke mezin in û karê wan hêjayî pesnê ye. Di vê hêlê de tê xuyakirin ku gramera ewil ji hêla merivekî bi navê Garzonî hatiye nivîsîn, xebatên ewil yên li ser serîhildana Şêx Seîdê rehmetî ji qelema Martin van Bruinessen û Robert Olson e, xebata ewil ya li ser Komara Mehabadê W. Eaglaton nivîsiye... Em dikarin dûr û dirêj behsa ked û xebata biyaniyan a li ser Kurdolojiyê û dîsîplînên nêzikî wê bikin. Lê mexseda min ne ev e... Bi van mîsalan ez tenê dixwazim nîşan bidim ku eger em wek gel "li xwe xwedî derketibana", emê îro di qonaxeke din de ban. Bi qasî ku biyanî "bi me re mijûl bûne, em bi xwe re mijûl nebûne".


Di dîroka me de gelek mijar hene ku em pê baş nizanin. Kar û xebatên danasîna wan di nav gel de kêm in û bi vî şiklî em xiyanetê li tarîx û hebûna xwe dikin. Yek ji van mijaran jî mîrektiya Merwaniyan e.

Merwanî di tarîxa me de rûpeleke zêrîn e û divê em wan nas bikin û bidin naskirin. Herçiqas ku li Tirkiyeyê li ser Merwaniyan kêm xebat hebin jî, di cîhanê de li ser wan gelek xebat çêbûne û kar û barê dezgeh û weşanxaneyên Kurdan e ku van xebatan bigihînin me.

Yek ji pisporên tarîxa Merwaniyan Thomas Ripperê Alman e ku li ser vê mîrektiyê li Almanyayê xebata doktorayê kiriye. Camêr bi qasî deh salan di kitûbxaneyên cihê cihê de geriyaye û hemû agahiyên bi şiklekî têkiliya wan bi Merwaniyan ve heye, peyda kiriye û di xebata xwe de cî dayê. Ev xebata han niha bi çapa diduyan li ber destê xwendevanan e. Gava min ev xebat dît, min him ew û him jî nivîskarê wê gelek meraq kir û herçiqas zehmet be jî, bi Thomas Ripper re hevpeyvînek kir û ew wergerand Kurdî.

Yek ji pisporên tarîxa Merwaniyan Thomas Ripperê Alman e ku li ser vê mîrektiyê li Almanyayê xebata doktorayê kiriye. Camêr bi qasî deh salan di kitûbxaneyên cihê cihê de geriyaye




Thomas Ripper

Wekî ku xwendevanên jêhatî bibînin, zimanê hevpeyvînê zimanekî ne ji rêzê ye; cumleyên Thomas Ripper dirêj in û dawî li wan nayê. Hêjayî gotinê ye, ev terz û uslub di nav Almanan de gelek belav e û ew wek yek ji xisûsiyetên xebata ilmî û biserketî tê qebûlkirin. Di wergera hevpeyvînê de min xwest ez vê cureyê xweîfadekirinê biparêzim. Ku heke hin cumle neyên fêmkirin, ji vê ye. **Va ye hevpeyvîn...**

*-Birêz Ripper, ez dilşad im ku bi we re li ser mijara Merwaniyan hevpeyvînekê çêdikim. Ez dixwazim ji vir dest pê bikim: Zanebûna li Almanyayê li ser Kurdan gelekî kêm e. Gava meriv behsa Kurdan dike, yan kîtaba Karl May ya bi navê "Kurdistana Wehş" yan jî Kurdên ku di salên 90î de di otobanan de rê li ber xelkê digirtin, tê bîra mirovan. Di vê çarçoveyê de berî her tiştî ez vê meraq dikim: Bi we re fikra xebata li ser Merwaniyan çawa çêbû?*

-Ji ber ku meraqa min li ser tarîxa herêma Îslamî heye, ez bi mîrektiyên Kurdan yên kevn jî hesiyam. Min meraq kir, ka îdareya otonom ya mîr û axayên Kurdan li herêmê ji hêla huner, avahiyên giştî, siyaseta îskanê bi çi terhî tesîr kirine. Min xwest ez bersiva van pirsan bibînim.

*-Êêê.... We kîjan cewab ji van pirsan re dîtin? Surprîz hebûn?*

-Ji hêlekê ve întibaya min ew e ku di demên aboriyeke xirab, hiqûqeke nediyar û îstismareke bêkontrol de serxwebûna herêmî li coxrafyaya xelîfatê îmkan da pêşdeçûna aborî. Ji hêla din, bi min wisa xuya dibe ku îdareya bi ihtiyad ya navendî ya sultanê Selçûkan Melîk Şah karîbûye avantajên împaratoriyeke mezin ji bo xwe bi kar bîne: Nebûna gumrukê û şerê li ser sinoran di nav hidûdê împaratoriyê de, parastineke bi rêk û pêk li hember dijminên derve û derfeta yekrêzkirina problemên aborî li hin herêman.

**Zimanê helbestê yê di Qesrên Merwaniyan de**

*-Ji aliyê çavkaniyan ve rewş çawa bû? Lêkolîna li ser vê meseleyê zehmet nebû?*

-Zimanê serdema navîn yê herêma Îslamî tabiî kî Erebî ye. Hetta di serayên Merwaniyan de jî zimanê şiîrê, bi qasî ku hatiye rîwayetkirin, Erebî bûye. Bi şoreşa Ebbasiyan re ji salên 750î pê ve misilmanên ne Ereb yên Împaratoriyê jî wekhevbûnek bi şervanên Ereb ve bi dest xistin. Me'mûrên îdareyê, yên ji kevneşopiya dewlemend ya çanda

Îranê dihatin, êdî kariyer dikirin û mewkiyên gelek bilind bi dest dixistin. Ji ber vê jî kêmî kêm Farisî jî di sedsala 11ê, yanê di dema Merwaniyan de, wek zimanê dudiyan yê cîhana Îslamî tê bikaranîn. Li hember vê, zimanê Kurdî ji ber devûdoreke koçberî nikarîbû li cîhana Îslamê bibe zimanekî din yê edebiyatê. Ji ber vê jî çavkanî bi pirranî bi Erebî û qismeke piçûk jî ji wan bi Farisî ne.

*-Çavkaniyên we bi dest xistin, ji bo ku hûn Merwaniyan nas bikin têr dikirin?*

-Ji ber hebûna xurt ya dezgehên îdarî û bi vê re jî girêdayî ji ber gulvedana çanda nivîskî ya wê demê li Rojhilata Navîn, gelek materyal hatine neqilkirin ku di heqê jiyana mîrektiya Merwaniyan de fikreke gelek baş didin me. Lê dîsa jî tesbît û agahiyên lêkolînerên din yên nû derdikevin holê hene ku ez di malpera xwe "Dokumente zur Geschichte der Kurden" de (Dokumentên li ser dîroka Kurdan) cih didimê.

*-Di lêkolîna vê mijarê de kîjan astengî derketin pêşiya we?*

-Ji ber ku min dixwest ez hemû xalên bi hebûna mîrektiyeke Kurd ya otonom re eleqedar in tesbît bikim, talûkeya ku ez di nav xebatê de wenda bibim, hebû. Mesela ez di waqayînameyan de li wê geriyam ka behsa neteweya hin kesan dibe yan na. Yan jî ez li bûyînên tabîatê (lehî, erdhej, hişkesalî) û gotinên talî hatine gotin ku di heqê civat, aborî, çandê malûmatan didin, geriyam.

*-Gava meriv behsa Merwaniyan dike, meriv diçe kîjan herêmê?*

**"Ji ber ku min dixwest ez hemû xalên bi hebûna mîrektiyeke Kurd ya otonom re eleqedar in tesbît bikim, talûkeya ku ez di nav xebatê de wenda bibim, hebû"**

-Herêma ku di bin kontrola Merwaniyan de bû, herêma Diyar Bekrê bû (bi Erebî: Welatê eşîra Erebên başûr ya bi navê Bakr ku di qirnê 7an de di çarçoveya fetha Îslamî de li wir bi cî û war bibûn). Yanê îro herêma Kurdên Tirkiyeyê.

Mîrektiya Merwaniyan ji eşîra Kurd ya bi navê Xarbutî/Xarbohtî derketiye. Ew ne di binê navê avakirê mîrektiyê, Bad Îbn Dûstak de hatiye naskirin; ew bi navê aşvan/qeraş Merwan hatiye naskirin ku bi xuşka Bad re zewiciye û sê kurên wî li dû hev ketine şûna Bad. Dîrokzan Îbn al-Atir dibêje ku Bad, beriya bibe hukimdar, şivantî kiriye. Herçiqas ku ew xizan bûye, wî dîsa jî pezên xwe qurbanî xelkê kiriye, ji bo ku yên din tiştekî ji bo xwarinê bibînin. Loma jî qedr û qîmetê wî her çûye zêde bûye û gelekan xwe lê girtine, wî bi dû re wek serkeleşê çeteyekê kar kiriye. Di vê demê de Bad tenê li herêma Xerzanê aktîf bûye.

Dîrokzan Sibt Îbn al-Cewzî û Îbn al-Azraq di heqê kurên Merwan de dinivîsin ku ew hukimdarê Kurmaşê bûne. Her yekî ji wan serleşkerek bûye û bavê wan, Merwan jî xwediyê aşekî bûye. Bi vî awayî hukimdar Bad, yê ku ji nava gel derdikeve, bi zewaca xuşka Merwan re dikeve nava malbateke bi qedr û qîmet. Bi îhtimaleke mezin vê qedr û qîmeta malbata Merwan îmkan daye ku li dû mirina Bad di nava Kurdan de lawên Merwan wek hukimdar bêne qebûlkirin. Bi vî awayî ev mîrektî bi navê malbata/binemala Merwan, ya bi tesîr, hatiye naskirin; ne bi navê Bad.

*-Em di skala demê de diçin kîjan dewrê?*

-Merwaniyan di sedsala 11an de, yanê di dema "showdown"a (şer/ceng?) (Tirkî güç gösterisi) Bîzans û Tirkan ya Milazgirê de hukim kirine. Yanê ew şer li ber sinorê herêma Merwaniyan çêbû. Lê koçberên biserketî yên Tirk di binê rêberiya Selçûkan de çûn rojava û Anatolyaya Navîn.

**Merwanî di navbera Eşîrên Ereb û Tirk de dimînin û têne felişandin**

*-Merwaniyan di vî şerî de roleke çawa lîstin?*


-Ji ber ku Sultanên Selçûkiyan tevî vazalên xwe yên li Mezopotamyayê lê geriyabûn ku rêya koçberên Tirk ji herêma xwe dûr bigrin û wan ber bi Anatolyaya Xrîstiyan ve bişînin, Diyar Bekr ji talankirinê hate parastin. Bi qabîliyeteke baş ya dîplomatîk Merwaniyan ziraeta li mîrektiya xwe parastin - digel xirabbûna devûdorên wan yên Xrîstiyan.

*-Fîgûrên sereke yên mîrektiya Merwaniyan kî ne?*

-Di kronolojiyên Îslamî de gelek caran mîrê Merwanî, Mîr Nasr ed-Dewle, wek



**"Di binê hukimê Nasr ed-Dewle de neteweyên wek Kurd, Ermenî yan jî Suryanî dikarîbûn bibin xwediyê tesîra polîtîk û kultura xwe pêşde bixin"**



qiralekî Kurd ji "Çîrokên Hezar û Şevekê" tê tarîfkirin. Wî ji 401 heta 453yê hicrî (mîladî: 1010/1011 heta 1061) hukim kiriye û ew ji aliyê hukimdarên mezin yên cînar wek Merwaniyê 1ê ku wek mîrê Diyar Bekrê hatiye qebûlkirin. Serkeftina wî aştî, aboriyeke pêşdeçûyî û pêşvebirina çandê ye.

*-Nasr ed-Dewle merivekî çawa bû? Hûn çawa dikarin wî terîf bikin?*

-Elbet ew ne keşîşek bû, lê ew merivekî ewqas ji dil bû ku wî li welatê xwe parastina heywanan jî dikir.

Bi saya têkiliyên malbatî bi mîrên piçûk yên devûdorê re wî îttifaqeke herêmî û sîstematîk ava kir. Bi vî şiklî wî çareserkirina îxtilafan bi rêya muzakere û lihevhatinê hêsan kir û serxwebûna xwe li hember çespên hegemonîk yên ji derve zexm kir. Dewlemendiyên ku wî bi dest xistin ji bilî parastinê (bi avakirina sûrên li dora bajêr), avakirina rê û pireyan û başkirina bidestxistina avê (bi avakirina kanalîzasyonan li bajêr, sîstemên avê) ne.

Endûstriya wê demê ji çêkirina tekstîlê pêk dihat–li Meyafarqînê (îro Silîva) hevrîşim û li Amîdê (îro Diyarbekir) cawê keten bû. Lê dewlemendiya aborî ya Meyafarqîn û Amîdê deyndarê cihê xwe ye ku li ser rêya bazirganiya navneteweyî ye. Rêya di nava Azerbeycan û Sûriyeyê ku heciyên ji Îranê bi kar dianîn, di ser Exlatê re derbasî Diyar Bekrê dibe (seyyahê dema Nasr ed-Dewle, Nasirê Xosrow di Şerefnameya xwe de bi berfirehî behsa vê rêya hanê dike).

Her wiha, rola bajarê Meyafarqînê jî mezin dibû. Di kendalê ava/çemê Bedlîsê re him ew rêya ji Exlatê diçe Meyafarqînê, him jî ya ji Dicleyê ber bi Ermenîstanê û Behra Reş diçe, derbas dibûn.

Di binê hukimê Nasr ed-Dewle de neteweyên wek Kurd, Ermenî yan jî Suryanî dikarîbûn bibin xwediyê tesîra polîtîk û kultura xwe pêşde bixin. Meyafarqîn bû navenda alim, edîb, şaîr, dengbêj, mûzîsyen, astrolog û hekîman. Gelê ji rêzê jî ji piştgiriya ilim û perwerdeyê îstifade kir, ji ber ku pirtûkxane û li Meyafarqînê nexweşxaneyek (di sala 414/1023-1024 ji aliyê Mîr Nasr ed-Dewle) hatin avakirin.

*-Mîrektiya Merwaniyan çiqas Kurd bû?*

-Mîrektî, vazalên wan û şervan di waqayînameyan de wek Kurd tên nîşandan û Kurdbûna wan mesela di nav arîstokratên şervan yên Ereb de dibe sebebê gengeşiyan. Lê di çavkaniyan de min nikarîbû tespît bikim, ka şexsiyetên ji dîwana Merwaniyan bi zanebûn Kurdbûna xwe dane pêş yan na.

Bi îhtimaleke mezin mirovan xwe li gorî tebeqeya xwe, xwe tesnîf kirine. Mesela serîhildana 1092-1093yan ya Meyafarqînê, dikare wek pro-kurd û antî-tirk were dîtin, lê gava meriv di çarçoveyeke mezin de li serîhildanên Marw, Nişapur û Helebê mêze dike, meriv dibîne ku hemû serîhildan, mîna Meyafarqînê, ji nava gelê ji rêzê (aubaş, eyar, exdat) dertê û arîstokratên bajêr (wucuh) xwe li Selçûkiyan digrin.

## Mamostê min

Raîfê Bêçare

Dersê didî xwendekaran
Xizan û feqîr û jaran
Dibî gula destê yaran
Kelemê çavê neyaran

Ji zarokan pir hez dikî
Bo hîn bibin tu lez dikî
Hundirê te hevdu dixwe
Ji kerba lêvan gez dikî

Kar dikî li dibistanê
Bihar, payîz, zivistanê
Ji nav mirovan tu bûyî
Dergevanê gulîstanê

Ev doza pêxemberan e
Xwendekarê te bira ne
Bi xwendinê dikevin pêş
Dibin mînanî çiran e

Mamoste yekî dilsoz e
Dike karekî pîroz e
Perwerdehiya mirovan
Ji xwe re kiriye doz e

Tu mîna dayik û bavan
Şemal didî wekî tavan
Xwedê alîkarê te be
Mamostê min malî ava

Rawestînê tu nizanî
Hînkirinê baş dizanî
Wek bilbilê li gulîstan
Stranbêjî xweş hozanî

Tu zana yî hunermend î
Geh li bajar geh li gund î
Wek şêran karê xwe dikî
Tu hêja yî, serbilind î

Tu bi sebr î bi sebat î
Tu bi ked î bi xebat î
Qevd qevd gulan pêşkêş dikim
Tu ser ser û çavan hatî

Mamostê min, mamostê min
Tu dilşa bibî dostê min

**Serhildanên Merwaniyan ên salên 1092-1093yê pro-kurd û antî-tirk in**

*-Dostên Merwaniyan kî bûn, dijminên wan kî bûn?*

-Hebûna mîrektiyên Kurdên wê demê bi wê ve girêdayî bûye ku wan di navbera sê împaratoriyên bi hev re di reqabetê de (xelîfetiya Fatimî û Ebbasiyan tevî Bîzans) bûn cî digirtin. Xisûsiyeta siyaseta Merwaniyan ew bû ku ew bi her sê hêzan re di têkiliyeke gelekî baş ya dîplomatîk de bûn.

Hevrikên talûke ji bo Merwaniyan şervanên kevn ên Erebên Diyar Bekrê bûn û bi dû re jî şervanên Tirk ên hatin vê coxrafyayê bûn.

Dagirkerên Ereb ên dema pêşîn ya Îslamî koçber bûn û bi vî hawî jî rasterast raqîbên Kurdan bûn – mîna eşîrên Tirkan yên bi dû re hatin.

*-Sebebê şikestina Merwaniyan çi bû?*

-Bi koça Tirkan û îstilaya Selçûkan mîzana di nav hêzên herêmê de ya ku Merwanî diparast hilweşiya. Merwanî dikarîbûn wek vazalên Selçûkan hebûna xwe dom bikin, lê Diyar Bekra dewlemend di nav herêma Bîzansiyan de ku ji ber diziyê û şer talan bûbû, cazîbeyeke mezin bû. Loma jî sultanê Selçûkiyan li gorî daxwaza serleşkerên xwe tevgeriya û herêma Merwaniyan li wan parve kir.●



# Berriya Mêrdînê û Qaçaxî

Konê Reş

> Di sala 1916an de, bi danîna sînor û bicîkirina qereqolên leşkerî yên Tirkan di seranserî sînorê Sûriyê û Tirkiyê de, ew pêwendiyên Serxetiyan û Binxetiyan qels û lawaz bûn; her malek bû du mal, yek li Serxetê û yek li Binxetê

Dema nivîsandina vê gotarê min bi piranî hêviyên xwe berdan ser bîra xwe a zaroktiyê, serwextiya xwe a niha û bîra hinek kalemêrên ku di nav bûyerên qaçaxê de bûn. Û bi wê zanebûna xwe a ezber û wek dîdevanê (şahidê) demekê a dîroka me Kurdên Binxetê, min beşek ji rastiya têkilî û pêwendiyên qedexe û qaçaxiya bi xwîn a ku di navbera xelkên me yên Serxet û Binxetê de dibû, daniye ber çavan û ji xwendevanên zimanê Kurdî re pêşkêşî dikim.

Di zaroktiyê de, bi bîrbûn û naskirina derdora xwe re, ji min re hat diyarkirin ku gundê min Doda li ser sînor e; sînor bi mayîn û têldiryanan pêçayî ye, qedexe ye ku em nêzîkî sînor û herdu şivên hesin bibin. Mezinan ji me re digotin; nêzîkî sînor û xeta hesin nebin, wê cendirmeyên Tirkan fîşekan berdin we, we bikujin û wê mayîn bi we de biteqin. Trên nas kir pê re bi tirsa teqîna mayînan xewa şevan diherimî.

Erê di wê bîreweriya biçûkanî de, min trên nas kir, ew trêna ku xeta wê di serê erdê me re derbas dibû. Hingê mezinan em ditirsandin û ji me re digotin; dûrî trênê kevin. Dema trên bê, xwe bidin paş, bayê wê mirov bi alî xwe de dikişîne û mirov di nav badokên lingê xwe de diperçiqîne. Ew trên ji ku dihat, diçû ku me nizanîbû. Di wê zaroktiyê de, çendî min dixwest, ez jî rojekê li wê trênê siwar bim û wek rêwiyên wê li dinyayê bigerim û bibînim. Car caran bi dizî, di hundirê besta Zorava re an besta Zixur re, min xwe digihand bin pira Zorava an Çûva, di ber û hesinê pirê de diponijîm û min ji xwe re digot; ji aliyê kê, kengî û çilo û çawa ev pira ha hatiye çêkirin. Çima ev sînorê bi mayîn di nav me û mirovên me yên Serxetê de hatiye danîn ku ne em dikarin herin bal wan û ne jî ew karin bêne rex me? Qet min nizanîbû ku ew pir Almanan di sala 1917an de çêkiriye û ew xeta trênê, Berlînê bi Bexdayê ve girêdide.

Di wê heyamê de jî, hin caran ji xew şiyar dibûm, min didît ku hewşa me tijî pez û dewar in û ode ji mêvanan dagirtiye